Şîrovekirina Klavya "Kurdish TestG"

Siwarkirina Klavya "Kurdish TestG" li ser komputer (PC)

1- Divêt pêşî hûn pakêta Kurdishg.exe ji vî lînkî, http://www.pen-kurd.org/kurdi/mustefa-reshid/ziman/kurdishg.exe bînin ser komputera xwe û li cihekî, ya here baş di "directory"-yekî taybet da – embar bikin. Di gava yekem da, gava hûn li Kurdishg.exe bidin, ji vê pakêtê ev file û directory-yên li jêr peyda dibin û li cihê ku we embar kiriye tên xuyakirin,

2- Piştî ku we ew gava jorîn avêt, divêt hûn niha "setup.exe" bitikînin. Gava "setup" temam dibe, klavya "Kurdish TestG" dikeve komputera we. Lê belê hên ne aktîv'e. Yanê tenha wek klavya (wek klavya austuryayî yan jî ya spanî yan jî ya fînlandî) di lîsteya klavyayan da xuya dibe.

3- Ji bo aktîvkirina vê klavyayê, divêt hûn di komputera xwe da biçin beşê "Control Panel" (bi almanî "Systemsteuerung", bi erebî "lewĥet teĥekum"). Bê guman, li gor sîstema komputera we, wek nimûne, heger "Windows 2000" yan jî "Windows XP", yan jî sîstemeka din be, êdî gavên ku hûn biavêjin ne mîna hev'in. Lê belê gavên ku hûn ji bona siwarkirina klavyayeka din diavêjin, ji bo siwarkirina vê klavyayê jî ew bi xwe ne; tenha cudahiyeka biçûk heye. Ew jî ew'e, ku divêt hûn vê klavyayê di bin navê klavya welatekî din da, yê ku ji we ra ne pêwîst'e, gazî bikin. Sedem jî ew'e, ku Kurmancî di lîsteya klavyayên welatan da tineye. Helbet, ji ber ku em hên ne welatekî serbixwe'ne, navê me hên di van lîsteyan da tineye. Ji bo aktîvkirina klavyayê, divêt hûn du tiştan hilbijêrin: Nav û naverok. Wek nimûne, hûn dikarin wek nav klavyaya "Deutsch (Österreich)" hilbijêrin û wek

naverok divêt ji bo vê klavyayê, hûn "Kurdish-TestG" hilbijêrin. Piştî ku we ev gav jî avêt, klavya "Kurdish-TestG" di komputera we da aktîv dibe.

3a- Ji bo "Windows 2000" ev gava dawîn (yanê aktîvkirina klavyayê) bi vî awayî ye:

- Di "Control Panel (Systemsteuerung) " da divêt hûn li vê "icon"-ê bidin.

Hîngê ev tablo xuya dibe:



piştî ku we ev klavya "Kurdish TestG" aktîv kir, êdî hûn dikarin li gor daxwaza xwe vê klavyayê li vî cihî hilbijêrin û bi kar bînin.

Gava hûn bixwazin bi klavyayeka din binivîsînin, hîngê ewa din hilbijêrin.

3b- Aktîvkirina vê klavyayê di sîstema "Windows XP" da hinekê cuda'ye, lê belê gelek dişibihe "Windows 2000".

1- Bikaranîna Klavya "Kurdish TestG" di komputer (PC) da

Me ev klavya "Kurdish TesG", wek bingeh ji ya almanî biriye, hin tîpên almanî ku di Kurmancî da ne pêwîst'in, me li cihê wan, tîpên Kurmancî yên ku di klavyaya almanî da tinene danîne. Pêşî li cihê tîpên biçûk binêrin.



Her wisa jî tîpên mezin.



Hûn dibînin, guhartina sereke ew'e, ku me ev tîpên Kurmancî "ş, ç, ê, î, û" li aliyê rastê yê klavyayê bi cih kirine.

Kesên ku dixwazin tenha tîpên Kurmancî bi kar bînin, heya vî cihî bixwînin bes'e.

Kesên ku hewesa wan ji wê yekê ra heye, ka gelo ev klavya "Kurdish TesG" hên çi gengazî û îmkanan pêşkêş dike, bila vî beşê duyem jî bixwînin

---

2 - Gengazî û funksiyonên taybet yên klavyaya "Kurdish TestG"

Daku hûn sedema afirandina van funksiyonan zanibin, divêt hûn pêşî gotara me ya bi sernivîsa "**Ji bo her dengekî êşmarek – Ber bi klavyayeka nû va**" bixwînin. Me di wê nivîsê da her tişt ji bo peydakirina vê klavyayê şîrove kiriye. Emê li vir tenha bi hin wêneyan bidin xuyakirin, ka me ew êşmarên (îşaretên) taybet di kûderê da bi cih kirine û çawa mirov dikare bi vê klavyayê wan hemû êşmaran binivîsîne.

Me ji bona vê armancê funksiyona "Dead-Key" daye hin gupikên vê klavyayê. Funksiyona "Dead-Key" ew'e, ku divêt mirov pêşî li wê bide û di pey ra li gupikeka yan jî tîpeka din bide. Gava mirov pêşî li gupika "Dead-Key" dide, hên ti tişt xuya nabe. Lê gava mirov li gupika din dide, hîngê ew êşmara ku di bin wê gupikê da hatiye bichkirin, tê nivîsandin.

Me di vê klavyayê da şeş "Dead-Key" danîne û ew li vir bi rengê sor dane xuyakirin,

1- Dead-Key ya yekem CIRCUMFLEX ACCENT: Me di bin vê gupika "Dead-Key" da ev êşmar(îşaret) bi cih kirine " ĥ, ẑ, ẍ, Ĥ, Ẑ, Ẍ" û helbet tîpên bi kumik " ê, î, û " dikarin dîsa bi vê rêyê jî bên nivîsandin.
2- Dead-Key ya duyem CARON: Me di bin vê gupika "Dead-Key" da ji bona tîpên me yên dudengî yên hişk ev êşmar bi cih kirine " ç, ǩ, ǐ, ṕ, ř, ť, Ç, Ǩ, Ľ, Ṕ, Ř, Ť ". Me di bin vê gupikê da, ev êşmarên taybet jî bi cih kirine " ǧ, Ǧ, š, Š, ǐ, Ǐ ".
3- Dead-Key ya sêyem CIDELA: Me di bin vê gupika "Dead-Key" da ji bona tîpên me yên dudengî yên nerm ev êşmar bi cih kirine " ķ, ļ, ŗ, ţ, Ķ, Ļ, Ŗ, Ţ ".

4- Dead-Key ya çarem LOW LINE: Me di bin vê gupika "Dead-Key" da ev êşmar bi cih kirine " b̲, n̲, d̲, ş̲, l̲, k̲, r̲, t̲, z̲, B̲, N̲, D̲, Ş̲, L̲, K̲, R̲, T̲, Z̲ ".
5- Dead-Key ya pêncem TILDE: Me di bin vê gupika "Dead-Key" da ev êşmar bi cih kirine " ñ, ã, õ, Ã, Õ ".
6- Dead-Key ya şeşem LES-THAN SIGN: Me di bin vê gupikê da ev êşmar bi cih kirine " đ, ǩ, š, ŧ, ż, Đ, Ǩ, Š, Ŧ, Ż ".

Di vê klavyayê da nivîsandina van êşmarên li jêr jî gengaz û mimkin'e.





Kombinasiyona "Shift + Ctrl" hên vala ye.


Keyboard Layout Creator 1.4 - 'Kurdish-TestG'
File Edit View Project Help
Show the Caps Lock
Shift states:
Shift
Alt+Ctrl (AltGr)
Ctrl
Backspace
Tab
Enter
Caps
Shift
Shift
Control
Alt
Alt
Control
Decimal Separator (numeric keypad)
Legend
Assignable
Dead key
Clipped Text
Unassignable
Current working directory
C:\Dokumente und Einstellungen\mr.TANTALOS\Eigene Dateien
Built keyboard layout location
Ready
Shft
Ctrl